

KIRÎZA NAN LI ROJAVA Û HEWLDANÊN ÇARESERKIRINÊ




Welat

PEYVA WELAT

Krîzên Aborî û xizmetguzarî li rojavayê Kurdistanê û Egerên Çareseriyê

Desteya sernivîs

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane



Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî

Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

2

Ezmûna rêveberiya xweser li rojavayê Kurdistanê gelek destkeftî bi xwe re ji gelên deverê re anîn, ev cara yekem e ku gelê kurd li gel gelên deverê xwe bi xwe bi rêve dibin. Rast e, ev rêveberî di rewşeke awarte de hate avakirin lê heya astekê dikaribû nemûneyekê ava bike, gelek xizmetguzariyan pêşkêşî gelên deverê bike û hevjiyana aştîyane biparêze, tevî ku di her dem û her çaxê de ew di jêr gefê de bû, çi gefên ji hêla rêxistina Daişê û rêxistinên radîkal ve bin yan gefên ji hêla dewleta Turkiyê û çeteyên bi ser wê ve bin, yan jî gefên ji hêla rêjîma Sûriyê û alîgirên wê bin. Hewldanên xerabkirina vê rêveberiyê qet ji holê ranebûne û roj bi roj zêdetir dibin.

Lêbelê, ev nayê wateya ku ev rêveberî nekete kêmasiyan de û xalên lawazbûnê tê de nînin, bi taybetî di warê gendeliyê û nebûna kesên pîspor di saziyên wê de.

Di dema dawî de gelek krîzên jiyanî li rojavayê kurdistanê derketin holê, ji krîza avê û kehrebeyê bigir heya krîza nan û xelayê.

Ji nişkê ve ev krîz tevde derketin holê, bêtir ku ti hazîrî yan plansazî ji hêla vê rêveberiya xweser ve hebin ku rûbirûbûna wan bikin û nehêlin mezin bibin, ev jî tê wateyê ku plansazkirina durist ya ku pêşbîniya krîzan bikin berê rûdana wan li cem rêveberiya xweser tinebû. Vê yekê bêzarek û nerazîbûneke mezin li cem gel afirandin.

Dibe ku destine nepaqij li dû van krîzan hebin, lê ev nabe behane ku rêveberî bi erkê xwe ranebe. Heya niha û tevî pîrbûna imkanên madî, hîn rewşa

xizmetguzarî li deverên rêveberiya xweser pir xerab e, ev yek cihê dax û mixabîniyê ye, her weha cihê lêpîrsînê ye çimkî ev pîrsgirêkeke bingeîn e û nabe ku bête paşguhkirin.

Ji rêveberiya xweser tê xwestin ku pêdivî û daxwazên gîfê berçav bigire û bi rengekî cidî li ser wan raweste û wan çareser bike.

Rast e, rêveberiya xweser hin gav avêtin ji bo başkirina rewşa gel ya aborî, ji wan gavan zêdekirina mûçeyên karmendan bû, lê ev tenê ne bes e, divê hemû çareyan ji hemû pîrsgirêkên jiyanî re bibîne, di serî de krîza nan, av û kehrebê ye.

Ev erkeke sereke ye ji erkê rêveberiya xweser e, da ku bikaribe li ser lingê xwe bimîne û di rûyê hemû gefên derveyî li ber xwe bide. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution



BUHARA GELAN Û DIZÊ HÊVIYAN

Hesên Xalid

Dema bayê hêviyan li gelê rojhilata navîn geriya pencerek ji omîdan di dîwarê jiyana wan de vebû û gelek baweriyên kevin di hizran de hatin rûxandin û astê rewşeke nû , jiyanê nû her çû bilind bû ...

- Weke ku em dizanin "belgeyên wêkîlêkîs" û belavbûna torên civakî - F -T - I... û bandora wan bûne sedemên rasterast ji tev gelên ku di bin desthilata sitemkar de dijîn, da ku serên xwe hildin û daxwaza kêmtirîn mafê xwe yê rewa bikin mîna wekhevîyê û bilindkirina derfetên kar û rewşebaşîya karmendiyê û serbest kirina jiyana ramiyarî û siyasî ...

Gelê Sûrîyê jî yek ji wan gelan bû ku dergeh û pencera xwe ji bayê guhartinê re vekir piştî rûdanên ku li Tûnis û Misrê gur bûn, û sînga xwe jî vekir bo jiyanê bi rûmettir û xweştir û kete xefka desthilateke bê dîlovan û ristourne diz de û hate xapandin bi siloganên ku di çîrisînîna mîna "yeke yeke yeke - gelê Sûrî yeke" û hin bang û siloganên din.

Piştî serpêhateya (serhildana Qamişloyê) a bû waneyek ji wan re, gelê kurd li Sûrîyê bi tirs li vê rûdanê meyze kir û tevgera ramiyarî hewil dan da deng û daxwazê gelê kurd pêk bîne di destpêkê de hewla avkairina desteya kurdî a bilind hatin kirin û hin gavên piratîkî hatin avêtin.

Lê mixabin ne rêjîm, ne jî rikberî li çareseriyê digeran, tenê dengê guleyan bilind dibû, destên derve xwe avêtin nav guropên çekdar li gorî bercewendiyên xwe / Turk- Qeter - Seûdiyê.../ her yek bi çavekî li bûyera ku li sûrî qewimî dimeyzand.

Sûrî bû qada tolhildanê ser asta rêjîmên derdora sûrî weke Turk û Sesûdiyê û Qeter ser rêbertiya beşê sunî ji misilmanan bi xewna vegeandina lehingiya osmaniyan , û ser asta

cîhanî de jî mîna Emerîka û Rûsya ku her du zirhêz qada Sûrî bînpê dîkin bo bercewendiyên xwe pêk bînin , lewre " şoreşa rûmetê " rûpela her kesê sûrî bînpê kiriye - şoreşa xwarina mîlakan - û ew jî wekû rêjîmê bûye dûvik ji Turkiya re û bi çavekî necad- perest li kesê ne sunî dimeyzîne.

Çi turk be ya jê çi îran be rikberiya berê a osmanî û sefawî nû dîkin û gelê derdorê dibe ardûyê şerê wan , turk bi çavê doza kurdî li rûdana sûrî meyze dike, her wiha îran jî bi çavê teşeyî3ê dimeyzîne û beşek ji kurd ta niha dikarîbûn xwe bi xwe bi rêve bibin ta asteke bilind binavê biratiya gelan û hin serkeftinan bi dest bixe û beşekî din ji wan nerîna wî cuda ye bi navê doza netewî bûye parçek ji rikberiya li dijî rêjîmê û roj bi roj deskeftinên ku berê bidest xistibûn ji dest diçe.

Di nav herdû sisteman de gel diqîre û hewil tene kirin ji aliyê general Mezlûm Ebdê serokê (MSD) û peymana navnetewî da ser hin xalên hevbeş herdû aliyan lihev bînin û rêveberiyê hevbeş birêve bibin a ku binavê rêveberiya xweser tê nasîn.

-Ta çi radeyê kurd dikarin bibin lîstikvan di sûrya pêşerojê de ?

? -Gelo wê karibin xwe bi derdora xwe bidin qayîl kirin

Doza sûrî dikeve qûnaxeke nû de lîstikvan her tim tene guhartin lê dirêjbûna kirîzê bi tevan rastiyeke daye nîşandan ku kurdê berî 15ê adara 2011 ne kurdê piştî 15ê adara 2011 ne û heger rikberî û rêjîm li çareseriyê bi rûmet bigerin dergehê mîletê bakur û rojhilatê welat ji wan re vekirîya û ji wan jî tê xwestin dergehê Şamê ji hevbeşê xwe re vekin. ■

ZIMAN Û RAGIHANDIN



Imran Yûsiv

Ziman ji bo hemû civakên mirovî derbirîneke rasteqîne ye, û ji bo pêşketin û geşepêdana gelan ew hêmaneke bingehîn e, her weha ziman yekîtiya gel, xurtbûna wî, çanda wî, kultore wî û bîr û baweriyên wî diparêze. Ziman ji bo pêşketina şaristanîyên mirovî hêmaneke sereke ye.

Girîngiya ziman ji vê rola wî ya karîger tê, ku ew beşdariyê di pêşketina hemû biwarên jiyana gelan ya civakî, siyasî, aborî, zanistî û wêjeyî û hunerî de dike.

Sê ast ji derbirîna zimanî re hene, asta yekem asta hunerî ya bedewî ye ku di biwarê wêje û hunerê de tête bikaranîn. Asta duyem asta zanistî ya razber e, ku di biwarê zanistî de tête bikaranîn. Asta sêyem asta pratîkî ya civakî ya asayî ye, ku bi giştî di rojnamegeriyê û ragihandinê de tête bikaranîn.

Ji ber ku mijara me zimanê ragihandinî ye, pêwîste ku em cure û rastiya zimanê pratîkî yê asayî binasin.

Asta zimanî ya pratîkî ya civakî yek ji her sê astên derbirîna zimanî ye ku di hemû civakên mirovî de hene. Ev her sê ast bi hev re radexa saxlemiya civakê ji hêlekê ve û asta lawaziya wê ya hizirî ji hêleke din ve destnîşan dike.

Cudahî di navbera civaka saxlem û yekgirtî û civaka nexweş û jihevketî de vedigire nêzîkbûna her sê astan di ya pêşî de, û dûrbûna wan ji hev di ya din de. Ji hev nêzîkbûna astên derbirîna

zimanî di civakekê de lihevhatina wê civakê, hevsengiya navnera katên wê de, û jiyanderiya wê ya çandî nîşan dide, piştî yekgirtina wê û saxlemiya wê ya hişî nîşan dide.

Serdemên ku tê de rengek ji lihevhatinê û wekheviyê di navbera her sê astên zanistî, wêjeyî û pratîkî de çêdibû, ew seredem qonaxine dîrokî bilind û geş bûn, lê eger ev ast ji hev dûr bin, dê rewşa civakê wêran, jêrketî û jihevketî be.

Ragihandin û pirsra zimanê petî

Gelek lêkolîner dibînin ku zimanê rojnemevanîyê û ragihandinê bi giştî rewşeke hevseng di navbera taybetmendiyên zimanî û belavbûna rojname û alavên ragihandinê de pêk aniye, dêmek ew hêsanî, saneyî û rastbûna xwe tête naskirin, lê ew ji zimanê gelêrî û yê serberayî di hizirînê de dûr dikeve. Li ver pirsra zimanê petî û yê gelêrî xuya dike wek pirsê girîng di zanista ragihandina zimanî de. ragihandin dikare zimanekî petî biafirîne û belav bike, û wê dûrahiya di navbera her sê astên ziman de ye bişkinê û wan astan nêzîkî hev bike. Ji ber ku rola alavên ragihandinê roleke mezin û berçav e, divê guhdan bi zimanê ragihandinê bête kirin, çimkî alavên ragihandinê ji hemû awayên din zêdetir dikarin zimanekî petî biafirînin û belav bikin, bi taybetî alavên ew alavên ragihandinê yên ku tene bihîtin û dîtin, wek radyo û televizyonan ku xwe dispêrin zimanê devkî... ev alav dikarin asta hemû zarav û zimanên gelêrî bi xwe hildin jor. Nivîser û fêlezofê kenedî Marşal Maklohan dibêje: "Peyva bilêvkirî her pênc pêhesînên guhdar bi awayekî dramî dikişîne". ■



HELBESTVAN MELA EHMEDÊ PALO

Gulal kasanî

Helebestvan mirovekî hestdar î pêjinker e, mîna bilbilekî bi kuldarî dinale, ji xwîneran re distre ji wan re awaz û bestan li gor kembera azariya wan dihûne, bi teşîya xwe ya seyr nalîn û xeman dirêse yan jî di gol û kendavên xwenên şîrmijî, hejar û perîşanan de bê saw avjeniyê dike, mîna şeyê resen di qada civakê, mêrga siruştê de bihîrehire bê gem û hevsar dibeze, dibeze ber keliha xewnan esman deklîşîne, Bi rehwan e, ey palo tu jî mîna ewrekî ji van ewrên biharî bi xummexum hawinga arînan, çîmenên ahingan dibarîne best û helbestan, bê vesih û rawestan ta gornê tu ne lukumî ey Palo.

Jiyana helbestvanê navdar Ehmedê Palo

Navê wî Ehmed e, kurê Muhemedê Mustefa ye, ew li ser mijara jidayîkbûna xwe wisa dibêje: li gor danzana Apan û Pîrkê di sala 1920`an de li herêma Palo li gundê Şêra Çûrê(Bakurê Kuristanê) ji dayîk bûme.

Hîn temenê Palo 5 salî bû, bûyrên pir giran bi serê wî de hatine, hin ji wan ji aliyê malbatê ve; Jiyanêke sêwîtî di bin perwerdehiya ap û pîrkê de jiyaye, û hin jî ji aliyê rewşa welêt ve, dema ku di bin nîrê Kemalîstan de dikazî, têkçûna şoreşa Şêx Se`îdê Pîran

Mella Ehmedê Palo di pirtûka bêranînê xwe de li ser rewşa Paşê ya jinavbrina hilistina şorşê û kewdanên stem û zilomata dewleta Tirk di wê hingê de rave dike û wisa dide ber pesindanê: Di wê hingê de welat seran ser bûbûye gola xwînê, ji alîkî ve kuştin û ji

aliyekî din ve şewtandina gundan, girtin û zindan ..Kurdistan kirin dojah

ji ber van bûyrên giran û ji neçarî, di 15`e saliya xwe de berê xwe dida Binxetê(Rojavayê Kurdistanê). Palo wiha bi vê hevokê neçariya xwe tîne ziman: Piştî min li pêtên êgir û berê min li welatê dûriyê

Seyadyê palo bi gelek zimanan dizanî bûye: Erebî, Tirkî, Farisî û bi zaravê Kurnanciya jorîn jî dizanî bû, ji bilî zaravê xwe yê Kurmancî.

Denganiya xwezayê di helbestên Palo de

Helbestvanê navdar di helbestên xwe de denganiya dengên cinawer, rihber, û nerihberan bi hostayî dide ber tevna helbestê û vedengiyeke lêxweş hatî ya dengê zindîweran dirêse û denganiya nerihberan li demrê jîneriyê dixê.

Wekî em dizan in dema ku ba radibe, xweza ber pêl û şepêla wê, dikeve gêrekê de, dengê balkêş vedide, palo jî wisa dibêje

Giv giva bayê seba ye

Raserê çiyayên bilind

Giya û heşîn di dema buharî de jîndar dibe û her wisa mezin dibe ji ber wilo jî şepêla ba bi wan re dikeve pêşbirkê de, bi ritmeke xwezayî deng vedide :

Xuş xuşa zad û giya ye



Li gund, deşt û zozanên Kurditsanê sewal ji aliyê welatiyan ve tên kedî kirin, dema berojava ji wê re tê gotin danepezan, pez ji çêrê vedigere cihê mexelê xwe, mak û berx bandikin hev û lêgerînê bo hev dikin:

Me' me' a berx û miyan

Ji xwe helbestvanê me dengên nerihberan jî di nav tevna helbesta xwe rêstine, dengê qirşan, newal:

Qirçe qirça qirş û qala Zim zima dengê newala

Lim lima avê çeman Tip tipa sêv û hinaran

Her wiha helbestvanê me dengê tav û birûskan jî, ji bîr nekiriye

Teq teqa berq û birûsk

Di xwezayê de dengê her tiştî heye rihber be yan jî nerihber be, ta dengê lat û keviran jî bi xweşî dinase:

Ding dinga lat û xaran

Her wiha dengê ceng û haleya gerîn, şingeşinga şûr û tîran, dengê top û hesinan jî di helbesta xwe de weke harmoniyeke mozîkî distire.

Gum guma topê giran Çinge çinga şûr û dasan

Zinge zinga hesinan Gim gima xap û palan e

Cardî helbestvanê me li xwezayê vedigere das û tapana xama xwe dangan bi hotsayî dide ber liqatê, dengê tilûr û balindeyan, çûk û çivîkan, pêl û gerên di avan de :

Pir pira têr û tilûr

Qij qija çûk û çivîkan

Xum xuma şîp û geran

Bax û bistank bijare

Gul sitêrê asîman

Berdewamiya jiyan wî ta koçkirinê

Seydayê navdar pirr azarî û êş ji ber koçberiyê kişandin . xwas, tazî û birçî di rê û duriyanan re, li çol û çeman ..di hêrik û çiyayan re bi keft û left geh diket geh dirabû, dev û lingên wî, cilên gerxute bi dilopên xwînê dihatin neqşandin

dibêje divê rêwingiya xwe de min nezanî bi kûve diçim lê her ber Başûr ve diçûm ta ku ez ketim xaka binxetê de, piştî 4 salan ji Şivantiyê min Cemîlê Seyda naskirîya û wî ez li gundê Xizna li mala Şêx bi cih kirima bo xwendina zaniyariya oldariyê û Endazan, dibêje: Min gelek beşên xwendinên xwendiyê: (Kêşan, Hok, Danîn, Awat, Sazkarî, Tore, Beyan û Usûl di gel zmanê Kurdî, Erebî û Farisî

Di 1946 an de û piştî xwendina xwe bi dawî kirîye, Sala 1948` an zewiciye û ji wê demê dest bi Melatiyê kiriye û ji hingê ve dest bi levirst û toredariya Kurdî kiriye.

Helbestvan Palo 7 dîwanên helbestî li dû xwe hiştine

Roja 9/5/199 Helbestvan Ehmedê Palo koça dawî kir û 1ê goristan Mehmeqê bi cih bûye, dilovaniya xweda li ser giyanê wî be

MIHAMED EMÎN ZEKÎ (1880 - 1948)



Dîroknaş û danerê baştirîn û buhatirîn pirtûk derbarê dîroka kurd û Kurdistanê de ye.

Di sala 1880 de li bajarê Silêmaniyê yê başûrê Kurdistanê ji dayik dibe.

Navê wî Mihemed Emîn Zekî ye, ew kurê Ebdirehmanê kurê Mehmûd e.

Di sala 1892an de derbasî dibistana seretayî ya fermî dibe ku li bajarê Silêmaniyê hatibû vekirin. Salekê lê dixwîne, piştê derbasî dibistana (Rîşdiyê ya leşkerî) dibe ya ku ew ji bo derçûna efseran li bajarê Silêmaniyê hatibû damezirandin.

Di sala 1896an derbasî dibistana leşkerî li Bexdê dibe, û piştî ku jê dedîçe li dibistana leşkerî ya li Stembolê qebûl dibe.

Piştî derçûna wî ya ji dibistana leşkerî di sala 1902an de, tevî yekîneyeke leşkerî dibe ku bi ser artêşa osmaniya şeşem ve bû û navenda wê li Bexda bû, derbasî dibistana erkan ya osmanî dibe û bi pileya serleşker jê derdîçe.

Ji ber ku serbazekî pîspor bû di warê enezariya leşkerî de, ew dibe endam di komîta amadekrina nexşeyan de ku di sala 1907an de li Stembolê hate damezirandin.

Piştî salekê ji endametiya wî, ew hate hilbijartin wekî endam di komîta destnîşankirina sînorên di navbera dewleta Osmanî û Bulxaristanê, her weha sînorên di navbera dewleta Osmanî û Rûsyayê de.

Gava ku şerê Belqanê di sala 1912-1913 de destpêkir, ew li gel hin serbazên artêşa osmanî ji bo Ferensayê hate şandin da ku li wir bîne rahênankirin.

Dema ku artêşa Brîtanyayê derbasî Bexdê bû, di 11 adara 1917an de, M.Emîn Zekî li gel hin yekîneyên artêşa osmanî vekîşîya bajarê Mûsilê, û ji wir vegeriya Stembolê. Û ji ber hevaltiya navbera wî û Mustafa Kemal (Atatork) de, ew hilbijart da ku alîkarê serokê artêşa osmaniyan ya hefem be li Stembolê. Û di hemû şerên ku li eniyên Felestînê û Qevqazya de qewimîn beşdar bû.

Di dawiya sala 1918an de, ji bo beşê desteya danîna dîroka leşkerî di wîzareta berevaniyê ya Turkiyê de hate veguhestin. Û derfet jê re petda bû ku dersên dîrokê li kolêça erkanan ya li Stembolê bide.

Piştî damezirandina dewleta Iraqê di sala 1920an

de, vegeriya Iraqê û wekî mamoste di dibistana leşkerî de, û fermandarê kolêça leşkerî hate erkdarkirin.

Di sala 1925an de dest ji xizmeta leşkerî berda, û kete warê karê siyasî. Wek nûnerê bajarê Silêmaniyê di parlemana Iraqê de hate hilbijartin, piştê postên çend wezaretan di hikûmetên Iraqê de girt, mîna wezareta kar û hatûçênê û wezareta bergiriyê. Navê wî bi zanebûnê, destpaqijiyê û dilsozîyê belav bû.

Di sala 1942an de û ji ber nebaşîya rewşa wî ya tenduristî dest ji kar berda.

Di 10ê tîrmeha 1948an de koça dawî kir û li goristana (Kurdê Sîwan) li bajarê Silêmaniyê hate veşartin.

M.Emîn Zekî gelek berhem bi zimanên Kurdî, Turkî û Erebî li dû xwe hiştin, ji bilî gelek xwendin û lêkolînên pir heja.

Ji bilî zimanên Kurdî, turkî û erebî, wî bi zimanên inglîzî, ferensî û farisî jî dizanîbû.

Mihemed Emîn Zekî lêkolînerekî hûrbîn bû, mebesta wî ya sereke ew bû ku bigihêje rastiyê, lewra gelek ger û lêkolîn dikir, û gelek belgenome û pirtûk didan hev berî ku di mijareke dîrokî de binivîse.

Pirtûka Mihemed Emîn Zekî ya (Dîroka Kurd û Kurdistanê) baştirîn û nirxdartirîn pirtûk e ku derbarê dîroka kurdan de hatiye nivîsîn, û ev pirtûk ji bo gelek lêkolîner û dîroknanan bûye jêdereke tekûz û belgenomeyeke bi bawerî. ■

ثمّ تفرّغ للكتابة ونشر كتاباته في الصحافة الورقية والإلكترونية، وفي صفحته الخاصة، وأسّس داراً للنشر اهتمت بنشر الكتب الأدبية له ولبعض أصدقائه، ولم يكن هدف دار نشره الربح، لأنّه لم يردّ أن يطرح نفسه ناشراً بل مبدعاً، مؤكّداً أنّ الغرب والآخر ينتظر منه تقديم ما هو حضاري وتنويري وإنساني في مجال الإبداع والثقافة. وهذا ما سعى إلى تحقيقه في بلاد الاغتراب.

يعمل على نصّ مفتوح، "أنشودة الحياة": قصيدة شعرية * ذات نفس ملحمي، طويلة جداً، تتألف من عدّة أجزاء، كل جزء (مائة صفحة) بمثابة ديوان مستقل ومرتبطة بنفس الوقت مع الأجزاء اللاحقة، أنجز المجلّد الأوّل من عشرة أجزاء ويشغل على المجلّد الثّاني وأنجز منه سبعة أجزاء، يتناول هذا النصّ المفتوح قضايا إنسانية وحياتية عديدة، مركّزاً على علاقة الإنسان مع أخيه الإنسان كمحور لبناء هذا النصّ.

تمّ تحويل الجزء الأوّل من أنشودة الحياة إلى سيناريو لفيلم سينمائي طويل من قبل المخرج والسيناريست اليمني حميد عقبي وقدمه كأحد محاور رسالة الماجستير في باريس.

وبالنسبة لأغلب المتحرّكين في لوحات الفنّان صبري يوسف، والذين يحضرون أحياناً في شكل أجساد كاملة صغيرة الحجم وفي أحياء أخرى على شكل وجوه بيضاء لكلا الجنسين؟ همّ شعب السّلام الجديد في أرض التّسامح والمحبة التي أسّسها صبري كبديل لأرض الحرب والموت. إنهم الأسرة البديلة التي يقترحها الفنّان على قارئه كي ينأى به عن لوثة الحقد والحرب ولغة السّيوف والدماء، داعياً إيّاه إلى أن يصيخ السّمع إلى جرس الطّبيعة، ويبني بيتاً جديداً تموج فيه الحمائم النّاصعة البياض الحاملة لمرسالٍ يُبشّر باخضرار الحياة في احتفال بهيج يقف فيه الإنسان جنباً إلى جنب مع أبجديات الطّيور والزّهور.

إذا كان الرّوائي التّركي الكردي يشار كمال يقول: "لا يوجد فرق بين رسّام وروائي" قد يصح ذلك عند صبري يوسف حين يكتب أو حين يرسم فكلّهما يحمل كمّاً من تأملاته البديعة، وكمّاً من كشوفاته التي تتحدّث هي نفسها، فهو يدرك الإدراك كله بتلك المكانة السّامية التي يحتلّها الإبداع بكلّ تفرّعاته في الحضارات الإنسانية، والتي لا يمكن تجاهلها، بل هي الفاعلة في البناء والتّشييد بطرقها الخاصّة في التّعبير والاختزال الكثيف، فلا يمكن أن نعزل صبري الشّاعر عن صبري الرّسام، فكلّهما



عن الحنين والعديد من مواضيع الحياة، مركّزاً على القصص السّاخرة والفكاهية التي حملت روح الطّرافة، كما حملت بُعداً اجتماعياً لما كان سائداً آنذاك، لأنّه يستوحي قصصه من عوالم الطّفولة والذاكرة البعيدة والقريبة، ودمج الواقع بالخيال فجاءت قصصه معبّقة بألق الحياة. أصدر خمس مجموعات قصصية، منها: "احتراق حافات الرّوح، ترتيلة الرّحيل، العلّوكة والطّبات، مفاجآت مدهشة للغاية، وهددات عشقية". كما أصدر ثلاثة أعمالٍ روائيةٍ استوحي فضاءاتها من عوالم الطّفولة وتجربته بالتّدريس وتجاربه الحياتية في الوطن الأم؛ مركّزاً على انسيابية جموح الخيال، وهي: "تجليات في رحاب الذات، قهقهات متأصلة في الذاكرة، وإلقاء القبض على حاسر الرّأس" وأصدر 77 كتاباً في الشّعر والقصة والرّواية والنّقد والمقال والحوار.

أسّس "مجلة السّلام الدّولية" في بداية عام 2013 وهي مجلة أدبية فكرية ثقافية فنية سنوية مستقلة ينشر فيها مئات الكتاب والشّعراء والأدباء والمفكرين والفنّانيين من دول العالم لترويج ثقافة السّلام والوئام بين البشر، وكان له نشاطه الإعلامي كمدير لبرنامج "Suroyo TV" (بطاقات ثقافية) في الفضائية السّريانية القسم العربي، وقدم 24 برنامجاً حوارياً مع مبدعين،



الأديب والفنان التشكيلي صبري يوسف

والفرح والحنين إلى عوالم الطفولة والشباب والحياة بكل رحابها، وكأني أتعانق مع تدفقاتي الشعرية. أكتب شعراً غُبر اللون، أجنح كثيراً نحو العفوية والتحلّيات اللونية، مستخدماً الرّمز والتّجريد والأزاهير وكأنّات بريّة وأهليّة وأشكال من حي الخيال والواقع أيضاً، حيث تبدو لوحاتي وكأنّها قصائد شعرية تمّ كتابتها غُبر اللون، ولهذا تبدو اللوحة وكأنّها الجزء المتمم للقصيدة، وفي هذا السياق قلتُ في إحدى الحوارات التي أجريتها معي "إنّ الشّعر والرّسم وجهان لعشق واحد هو الإبداع"، لأنني أرى أنّ الذي لا يعشق الشّعر أو الرّسم بعمق، لا يستطيع إنجاز نصّ شعري عميق الرؤية أو رسم لوحة فنية غنيّة بمساحاتها وأجوائها". اللونية المناسبة بتجليات الإبداع

استهوته الكتابة الأدبية، وهي شغفه واهتمامه الأول والأخير، وقد بدأ الكتابة قبل اغترابه، لكن تجربته الأولى كانت غير مركونة على أسس جريئة كما صرّح بنفسه، وقد منحتّه تجربته الأدبية في دنيا الاغتراب على مدى أكثر من ربع قرن الكثير من الحرّية والصّفاء والتأمّل والإبداع، وله وجهات نظر في الشّعر والقصة والرواية والأدب عموماً، ويرى أنّ الشّعر أعمق من أن يعرفه الشّاعر أو أي ناقد، كما يرى أنّ أيّة لغة في العالم غير قادرة على احتضان فضاءات الشّعر، لما فيه من تدفّقات شاهقة في البوح تعجز لغات الكون عن ترجمتها. وقد كتب عدّة دواوين شعرية، أهمّها أنشودة الحياة التي تحمل نفساً ملحمياً، وتمّ ترجمة الأجزاء العشرة الأولى منها إلى اللغة الإنكليزية عبر دار صافي للنشر في واشنطن، وكتب الشّعر العمودي والتّفعيلة منذ بداية المرحلة الثّانوية، لكنّه سرعان ما هجر الشّعر الموزون واستهوته فضاءات قصيدة النثر لأنّها حقّقت تدفّقاته الشعرية التي تنساب كحبّات المطر، كما كتب القصص الاجتماعية والإنسانية والعشقية وقصصاً

أديب بامتياز لم يترك حقلاً لم يزرع فيه، ويحصد» بنجاح، هو مؤسسة كاملة بل ورشة عمل ثقافية لا تهدأ، في أعماقه أجنحة تحلق مع حماملته نحو السّلام الذي يكاد يكون مشروعه الأغنى، هو إنسان أولاً، وأديب ثانياً، وفنان ثالثاً؛ وهذا يجعلنا نتفاعل بأي مشروع يخطّه قلمه أو ريشته، له تجربته الموسيقية فهو عازف عود [ويعشق الموسيقى]؛ وهذا ما يجعل جلّ أعماله الأدبية والفنية والموسيقية حالة متجانسة بل ملتحة كالرّوح». هذا ما كتبه "الأديب والنّاقّد" غريب ملّا زلال

كان الرّسم إحدى وسائل التّعبير عن الطّموحات الإبداعية للفنان والكاتب صبري يوسف، فعُبر اللون ترجم تدفّقات مشاعره وتطلّعاته، وقد جاءت بداياته الفنية متأخرة عام 2004 وقبلها كان مهتماً بالخطّيطات والرّسم بأقلام التّلوين والحبر الصّيني، وشغوفاً بالخطّ العربي، ويقول في هذا السياق: "أرسم أعمالي بالسّيّكين والفرشاة النّاعمة، بأسلوب شاعري فطري طفولي حلمي تخيلي، وبعده مدارس فنية، بعيداً عن التقيد بأساليب معيّنة في عالم الفن، فلا أتوقّف عند مدرسة أو تيار فنيّ معيّن، بقدر ما أتوقّف عند مشاعري العفوية المتدفّقة مثل حنين العشاق إلى أعماق تجليات الرّوح، أو مثل شلال يتدفّق من أعالي الجبال، أو كشهقة طفلٍ لاشراقة الشّمس في صباح باكر، حيث تتداخل عدّة أساليب في اللوحة الواحدة، وغالباً ما تتدفّق هذه الألوان بشكل عفوي حلمي تأملاتي، ثمّ تتوالد الأفكار وتتطوّر وتتناغم الألوان خلال عمليّات الرّسم، ويتميّز الأسلوب الذي أشتغل عليه بالتّدفّقات اللونية وموشور إنسيابية الأفكار ضمن إيقاع لوني فيه من الموسيقى والرّقص



شارك في العديد من الأماسي الشعرية والقصصية والندوات الأدبية في الوطن الأم سوريا والسويد والعراق.

ونال عدة جوائز تكريمية متفرقة

أنجز مشروعه الموسوعي في أدب الحوار الذي حمل عنوان: "حوار مع الذات، ألف سؤال وسؤال"، بأجزائه العشرة. يدور الحوار حول تجربته الأدبية والحياتية في الوطن الأم سوريا وفي دنيا الاغتراب بصيغة قريبة من السيرة الذاتية، وبأسلوب أقرب من السرد الروائي والقصصي والسيرة الذاتية والنصوص الأدبية منه إلى الحوارات التقليدية السائدة، مركّزاً على تقديم تجربته الحياتية أدباً وفناً بشكل موسّع، كما يطرح عبر الحوار العديد من التساؤلات حول مبدعين ومفكرين من الشرق والغرب ويجيب عنها، وتعتبر هذه التجربة الحوارية مع الذات تجربة نادرة قلما يطرّقها أدباء من الشرق أو الغرب بهذه الشمولية والخصوصية والفضاءات المفتوحة على مسارات عديدة ■

متداخلان إلى حدّ نقاوة الرّوح. صبري يوسف أشبه بقائد مركبة يقودها منذ صباه، يقودها شعراً مرّة، ومرّة بنصوص نثرية، وأخرى باللّون، باتجاه الحياة التي يستحقّها هذا الكائن الذي يطلقون عليه الإنسان، باتجاه حياة يسودها الحب والسّلام والوئام، أهدافه العذبة في هذا الزّمن المالح، فهو يكشف بقوّة العاشق للحياة عن مفاتها وعذوبتها ونقائها، وبكلّ ما أوتي من حب، وهو المجدول بهذه المفردات، وبها ينبض، وبها وإليها تنبض كل نتاجاته، فبشفافية عالية يطارد الجمال ويعيد صياغته بنكهته هو، وبشروط تجعل من لغته في مستوياتها المتعدّدة ما يفسر الوجود وحقيقته بخصائص صوتية مميّزة

وهو الذي قال "بأنّه على قيد الحياة، وقيد الحرف، على قيد الكلمة الخلّاقة، واللّون، على قيد العبور في مهجة الإبداع، وحلم مفتوح على مساحات الدّنيا، على قيد الحنين إلى ديريك العتيقة، وهو القائل يوماً وما زال يُردّد قائلاً: "أنا ابن ديريك العتيقة، ابن المسافات وأحزان الدّنيا، شهقة بكاءٍ شهية، لمعانقة حرفٍ من لون المطر، أنا على قيد فكرة تتجاذبها صواعق الكون، أنا صديق العصافير وأزاهير البراري، أنا صديق غيمة من بكاء، أنا سلسلة مترصصة بأحزان لا تخطر على بال، لكّني أعرف كيف أنتشل روعي من ضجر هذا الزّمان، وأجسد حرفي فوق خارطة الكون، كي أكون على قيد الكلمة". وليس على قيد الحياة

يكتب صبري يوسف حرفه بكامل حرّيته ومن وحي بهجة الحياة، وفي أوج تجلياته وكأنّه يخلّق في غمار الفرح ويعانق زرقاة السّماء، يضحك مع قهقهات الأطفال، ويكي من تنالي خشونة الانكسار، يسخر من الزّمن القبيح، زمن من لون الغدر المير، ومع كل هذه المرات المنقوشة على خصوبة العمر، يخرج أقوى من أقوى أقوياء الكون، متسلّحاً برجاجة العقل والحرف ورجاجة القناعات، يخلّق في أعالي قبة الكون

أقام الأديب والفنان التشكيلي صبري يوسف عدّة معارض فردية وشارك في معارض جماعية في ستوكهولم

قدّم معرضاً فردياً في صالة الفنّان إبراهيم قطّو، وثلاثة معارض فردية في منزله في ستوكهولم، وأربعة معارض فردية في صالة "ستور ستوغان" في ستوكهولم، ومعرضاً فردياً في صالة المركز الثقافي العراقي: غاليري كاظم حيدر في ستوكهولم ضمّ مائة لوحة. ومعرضاً فردياً في صالة النّادي السّوري في ستوكهولم

وشارك في معرض جماعي في صالة الفنّان إبراهيم قطّو، وفي معرض جماعي في أوسترا غيمنازيت في ستوكهولم. وشارك في معارض جماعية أخرى في غاليري هوسبي الفنّية، صيف 2016، 2017، 2018، 2019. وشارك في المهرجان التشكيلي السنوي السادس للجمعية المندائية في ستوكهولم كضيف شرف

FERHENGOK

peyman	معاهدة
Rêkeftin	اتفاقية
danûstandin	مفاوضات
nakokî	صراع - خلاف
rikberî	معارضة
agirbest	وقف اطلاق النار
Danpêdan	اعتراف
nermahî	مرونة
Red kirin	رفض
pejirandin	قبول
paşxistin	تأجيل
biryar	قرار
daxuyanî	بيان
garantor	ضامن
hilbijartin	انتخابات
kandîd	مرشح
çavdêr	مراقب
serpirîştî	اشراف
nûner	مندوب
encam	نتيجة



حول هذا الموضوع و للوقوف على أسباب ارتفاع أسعار العقارات قامت مجلة ولات باستطلاع آراء بعض المواطنين.

المواطن عادل حسو و هو متعهد بناء تحدث لمجلة ولات عن سبب ارتفاع أسعار العقارات مبينا أن انهيار الليرة مقابل الدولار وارتفاع اسعار مواد البناء والأيدي العاملة أدى الى هذا الارتفاع الجنوبي في أسعار العقارات، فاليوم نشترى معظم المواد بالدولار طن الحديد ٦٢٠ دولار وطن الاسمنت ٥٨ دولار امريكي.. نحن نتماشى مع الأسعار نحن نعلم بأن أسعار الشقق عالية بالنسبة لفئة كبيرة من الناس وفي المقابل هناك طلب على العقارات من فئة أخرى من الناس ونحن أيضا نتمنى ان يستقر سعر الدولار ويهبط لأن ذلك يزيد من عملية البيع والشراء.

محمد سلو مواطن من عامودا تحدث لنا قائلاً لقد أصبح الحصول على بيت في المنطقة حلم لدى اغليبتنا نحن لازلنا نقبض راتب من الدولة بقيمة لا تتجاوز ٣٥ دولار وقل حسب سعر الصرف والآن أصغر بيت أو شقة عالعظم يتجاوز ٢٠ الف دولار امريكي فكيف لنا أن نملك بيتا مع هذه الأسعار الباهظة.

دليل احمد مواطن من عامودا يعيش في بيت إيجار تحدث لنا بأنه يعاني من ارتفاع أسعار العقارات و قال : أنا أعيش مع أهلي في بيت إيجار ب ٥٠ الف ليرة سورية في الشهر وهو عبارة عن بيت عربي ٣ غرف طين ومنافع لكن مع ارتفاع أسعار البيوت يطالبنا المستأجر بزيادة الإيجار أو أنه سيخرجنا منه ونحن ملزمين ان ندفع الزيادة لاننا لانستطيع استئجار شقة ب ١٠٠ دولار في لشهر الواحد.. نتمنى ان ينزل قيمة الدولار كي تنزل معها أسعار العقارات أيضاً.

هناك أسباب كثيرة لغلاء العقارات في مناطق الادارة الذاتية و هناك لعبة يلعبها تجار العقارات مع وجود طبقة فائقة الثراء أنتجت ظروف الحرب.

مع انهيار الليرة.. ارتفاع جنوني في أسعار العقارات



أفسان كردي

ارتفعت أسعار العقارات في مناطق شمال شرق سوريا بشكل كبير في الآونة الأخيرة، ويأتي هذا الارتفاع نتيجة لارتفاع الدولار وهبوط الليرة، ارتفعت أسعار مواد البناء بشكل كبير لثلاث أضعاف عما كانت عليه العام الماضي، وكثير من الناس اتجه لتحويل سيولته النقدية إلى شراء عقار خوفا من انخفاض الليرة أكثر مما زاد في ارتفاع الأسعار أيضا.

وتتراوح أسعار العقارات ما بين ٢٠ و ٣٠ الف دولار امريكي

وهذا يضيق على فئة كبيرة من عامة الناس الذي لا يستطيعون شراء منزل بهكذا أسعار وفي المقابل ارتفاع أسعار العقارات أدى أيضا إلى ارتفاع اجارات البيوت حيث أصبح إسئجار منزل لا يقل عن ١٠٠ الف ليرة سوري في الشهر

وعلى الرغم من هذا الارتفاع ألا أنه لايزال الطلب يتزايد على شراء العقارات وأغلب هذا الطلب يأتي من المهاجرين الذين يقيمون في البلاد الأوربية والتجار الذين يكسبون مبالغ طائلة من تجارة العقارات و يتحكمون في أسعارها، أما عن سبب ارتفاع قيمة استئجار البيوت فيعود الى الضغط البشري على المنطقة خاصة بعد الاحتلال التركي لمناطق عفرين ، سري كانييه (رأس العين) و تل أبيض مما أدى الى موجة نزوح و تهجير لم تشهد المنطقة مثيلا لها من قبل، اضافة الى هذا و ذاك فأن تواجد عدد كبير من المنظمات في المنطقة ساهم أيضا في ارتفاع اجارات البيوت و العقارات.



بالهجرة في اسبانيا. كانت الاوامر تقضي برفض قبول طلبات الراديكاليين والمرشحين ذوي الميول السياسية و الفكرية المفرطة. شكلت رغبة فيكتور و روزر في انقاذ الطفل بأي ثمن، على عكس توقعاتهما، العامل الأقوى في كسب تعاطف الشاعر نيرودا و منحهما موافقة العبور إلى السفينة.



أنقذ الشاعر التشيلي
"بابلو نيرودا" الآلاف
من لاجئي الحرب
و الكاتبة التشيلية
"إيزابيل الليندي"
تكتب عن قصة اثنين
منهم



بقلم بولا ماكليين

مقال مترجم من جريدة نيويورك تايمز

ترجمة : محمد رمضان

يتزوج فيكتور لاحقا من زوجة أخيه روزر. لم يكن هذا الزواج بداعي الحب و لكن كان بداعي الدعم و الثقة المتبادلة. فقد تعمقت شراكتهم إلى صداقة عميقة و شراكة تكافلية بعد أن بدء حياة جديدة في سانتياغو عاصمة تشيلي. فقد أدركا بأنهما لا يستطيعان تخطي ما فقدها أو استرجاع الإحساس بقيمتيهما إلا عندما يكونان معا .

يعتبر مفهوم الحب و الانتماء مفهومين معقدين على نحو مُرضي في هذه الرواية، حيث تتعرض الروابط الحميمة للاختبار عندما تتجه الأوطان نحو الاضطراب و يبدأ صراع الأخوة. ستواجه تشيلي التي فر إليها الزوجان أيضا مصير اسبانيا بسبب الحكم الديكتاتوري مما يدفع نيرودا إلى الاختباء خارج بلده. و يُصبح فيكتور و روزر منفين كرة أخرى حيث تصبح فكرة الوطن عندهما بعيدة المنال و أشد إيلاما.

إن تجربة النفي ليست غريبة على كاتبة الرواية الليندي أيضا. حيث فرت من تشيلي إلى فنزويلا في السبعينات إبان حكم الجنرال بينوشيه و ظهور اسمها في قائمة المطلوبين. عاشت الليندي ثلاث عشرة سنة في فنزويلا فرارا من الموت. و هناك في فنزويلا كتبت الليندي "بيت الأرواح" أول رواياتها بل ربما أفضل أعمالها الروائية. تقول الليندي لولا التشرد، لم أكن لأصبح كاتبة، ربما. قد تكون الحرب الأهلية إعصارا يدمر الكثير في طريقه كما تخبرنا إحدى شخصيات الرواية، و لكنها قد تكون أيضا قوة دافعة لتغيير الأفراد و الأمم على حد سواء. ربما عملت تجارب الكاتبة الليندي الشخصية في توسيع منظورها و حساسيتها تجاه السياسات و الأيديولوجيات المعقدة. تظهر الليندي براعة و اتزانًا هائلًا في كلتا الحالتين في هذا العمل الروائي الأمر الذي خلق قصة واقعية و مترابطة منطقيا.

في رواية "بتلة البحر الطويلة" كما في كثير من أعمال الليندي، هناك شعور بأن الحياة البشرية عبارة عن رحلة و أن كيفية و مكان التواصل هو الذي يخلق نسيج وجودنا؛ أي مصدر انسانيتنا. إذا ما كان ما يحصل لنا - أي محور قدرنا- خارج نطاق سيطرتنا، و عصيا على التغيير، فإنه ما يزال في مقدورنا اختيار ما نلتزم به و نناضل من أجله، رافضين الهزيمة. هذا هو الانتماء الحقيقي و هكذا بنينا العالم.

"إزابيل الليندي روائية تشيلية ولدت في أغسطس 1942، وحاصلة على العديد من الجوائز الأدبية المهمة، ومن الأسماء المرشحة دائماً للحصول على جائزة نوبل. تُصنف كتاباتها في إطار الواقعية السحرية، وتنشط في مجال حقوق المرأة والتحرر العالمي.

*تم اصدار رواية "بتلة طويلة من البحر

في 14 أيار 2019

*ضمن قائمة أفضل الكتب مبيعا في جريدة نيويورك تايمز

*يشير عنوان الرواية "بتلة البحر الطويلة" إلى دولة تشيلي التي تشبه بتلة عشب بحري على طول الساحل الغربي لأمريكا الجنوبي. ■

في كانون الثاني من عام 1939 و بعد ثلاث سنين و نصف من الحرب الاهلية الأسبانية الكارثية يهزم فرانسيסקو فرانكو الجيش الجمهوري الاسباني في برشلونة ليقوم بعدها حكما ديكتاتوريا يستمر قرابة نصف قرن شرد فيها مئات الالاف من الجنود و الناشطين و أنصار الجمهورية. هرب الكثير منهم عبر جبال البيرنيه إلى فرنسا طائنين أنهم قد فروا من المصير الأسوأ ليصدموا بمصيرهم خلف الأسلاك الشائكة في معسكرات الاعتقال كما في معسكر "أرجيليه-سور-مير" مواجهين مصيرهم بين الحياة و الموت من الجوع البرد.

بعد أن بدا العالم غير آبه ليس فقط بتشريد الشعب الأسباني بل بالحرب الأسبانية أيضا، يشكل الدبلوماسي والشاعر التشيلي "بابلو نيرودا" مجموعة ضغط لإنقاذ حياة أكثر من ألفي لاجيء حسب ما تسمح به حمولة سفينة النقل "وينغ بينك" التي تسع تسعة أطنان و التي خصصت لهؤلاء اللاجئين السياسيين.

يذكرنا عمل الشاعر نيرودا الأنساني البعيد المدى "بأوسكار شيندلر" الذي أنقذ مئات اليهود من النازيين . يشكل هذا الحدث التاريخي المغمور نواة العمل الروائي "بتلة البحر الطويلة" السابع عشر للروائية "" إيزابيل الليندي".

سمعت الكاتبة، حسب مذكراتها، أول مرة عن سفينة الأمل التي أطلقها الشاعر نيرودا عندما كانت طفلة. بقي هذا الاسم في ذاكرتها طيلة أربعين سنة. و ها هي الآن تبرع في حياكة تلك الحادثة الحقيقية مع الذكريات و التاريخ في عمل روائي لتنتج واحدا من أغنى الأعمال تصويرا للحرب الأهلية الأسبانية حتى تاريخه. و هو واحد من أقوى الأعمال و أكثرها تأثيرا في مسيرتها المهنية. يتتبع العمل الذي يغطي أجيالا و قارات قصة زوج لاينسي من المنفيين الذين سُمح لهما بالعبور إلى ظهر سفينة النجاة.

الزوجان هما: فيكتور دالموا، و هو مساعد طبيب في الحرب و روزر بريجويرا، و هي امرأة شابة تحمل طفل شقيق فيكتور غوليم الذي فُقد في الحرب.

تعطي الحكومة الشيلية الأوامر لبابلو نيرودا باختيار المرشحين بشكل مدروس باعتباره القنصل التشيلي الخاص

MEHMÛD H ESEN B E R A Z Î

“Sêparî Helbestên Me Dîlok in”.

Hevpeyvîn: Imran Yûsiv

-Di destpêkê de, em hez dikin ku hûn xwe bi xwînerên kovara Welat bidin nasîn.

Bi rastî ez nizanim kangî hatim vê dinyayê, lê dayîka min, xweda bi dilovanîya xwe şa bike digot: Tu salekê berî sala xerab û roja sisîyan li paş Cejna Hecîyan hatî dinyayê. Cejna ku li nava zarokan bi cejna Şekir dihat nasîn û zarok gelek pê kêfxweş dibûn, tenê ez digirîyam. Jixwe sala din bi navê sala xerab hate nasîn, ew jî belkî ji bextê min î reş be. Navê min Mehmûd bû û li gundekî Başûrî bajarê Kobaniyê hatibûm dinayayê, lê jiber ku ez di Cejna Hecîyan de hatibûm dinyayê, her kes min bi navê Hecî yan Hecî Mehmûd nas dike û nêzikî 18 salên ku min ji temenê xwe di nava siyasetê de, çi li bajar û gundan û çi jî, li çîyayan derbas kirin bi heman navî bûm. Ev nav bû benîşt û bi min ve zeliqî ma. Zaroktiya xwe min li navbera gundê Boxaz û kolanên Kobaniyê bihûrand û xoratnî û dibîstan jî, li bajarê Minbijê. Ji 18 salên di nava siyasetê de min 14 sal jî wan li serê çîyayên Kurdistanê derbas kirin. Piştê ku min dest ji siyasetê berda, nêzikî 8 salan min firmeyek avahiya malan, bi navê Fîrmeya Lûtke li Efrîqîya, li Paytexta Lîbiya, li bajarê Terablus damezirand û li wir xebitîm. Ev serê 4 salan e jî, li Ewropa li bajarekî nêzî bajarê Frankfurta Almanî li gel zarokên xwe dijîm.

-Jixwe hûn helbestê, hem jî çîrokê dinivîsin, ji



kîjanê bêtir hûn hez dikin û çima?

-Jixwe jîyana Kurdan çîrokeke dirêj e. Çanda Kurdî tev Çîrok in. Beşê herî mezin ji wêjeya Kurdî di nava çîrokê de veşartî ye, anku bi gotineke din, çîrok di hemû beşên wêjeya Kurdî de xwedan roleke sereke ne. Helbesta ku çîrokeke xwe ya diyar nebe, ew helbest tenê dibe rêzkirina gotinan. Çîrok tov û naveroka helbestê ye. Helbesta bê çîrok mîna nanê bê xwê ye. Di nava ristên her helbestekê de çîrokek heye. Bala xwe bidin helbestên Klasîkên Kurdan, Ahmedê Xanî, Melayê Cezîrî û Alî Herîrî, mirov vê yekê bi zelalî dibîne. Jixwe Helbestên Helbestvanê nemir Cegerxwîn bi van nimûneyan tijî ne. Stranên dengbêjên

Kurdan, her yek çîrok e. Bêguman pareke mezin ji stranên hunermend û dengbêjên nû jî weha ne. Ev çîrok çî civakî yan siyasî bin û çî jî dîrokî yan deronî bin, ew stûnên bilind û qalind yê çand û wêjeya kurdî ne. Di roja îro de, roman ku wekî astê herî bilind ji wêjeya nûjen tê nirxandin, ew jî li ser koka çîrokan tê avakirin. Ez jî, wekî kesek ji vî civakê û di nava pêlên deryaya vî çand û wêjeyê de mezin bûm, bêguman ev bû sedemeke mezin ku mereqa min bikşîne ser xwe û karibim di rêya nivîsadina çîrokan re parek ji êş û azarên gelê xwe, nexasim dema ez tê de jîyayî bim, bînim ser ziman û aşkere bikim. Ez her dem vî dibêjim, sêparî helbestên me kurdan dîlok in, sêparî romanên me kurdan çîrok in. Eger di wêjeya kurdî de, helbest û roman rûn û penêrê wêje ne, bêguman çîrok şîr û mastê wê ne.

-Wek tê zanîn hûn ji bajarê Kobaniyê ne, Gelo heya çî radeyê wî bajarî bandor li ezmûna we ya nivîsandinê kiriye ... û ew cih û jîngeh ji bo we çî wateyê dide?

-Di jîyana xwe de min gelek biryar bi serê xwe dan, biryarên mirin û jîyanê, bîyî ku bi kesî bişêwirim min didan, û qet jê poşman nebûm, lê tenê carekê ji biryara xwe poşman bûm, ew jî ji bo bajarê min Kobaniyê bû. Di serê meha Tebaxa 2014 an de, berî ku DAÎŞ êrişî bajêr bike, min

kare xwe li Efrîqîya hîşt û ez bi qaçaxî, di ser Tirkîyê re vegeyîyam bajarê Kobaniyê. Dema şer dest pê kir min xwe amede kiribû û çekeke wekî ku min li çîyan radihişte wê kirî û çend caran dema şer qewimî çûme nava çeperên parastinê ku hinek hevalên me yên Kevin li wir bûn. Lê dema ku li min dinêrîn wekî ku min nanasin nîşan didan, tevî kesên serkar bûn û berî ku ew biçin çîyan ez berpîrsîyarê wan bûm. Lewma li çetînîya min hat û min biryara vegeyê da. Min ew çar meh li ser her du alîyên sînor derbas kirin. Bêguman, qet nebûya min jî karibû wekî şervanekî nû berevanî li bajarê xwe bikira, ev bû kulek û di dilê min de heya roja îro maye. Kobanî bajarê ku ez lê vejîm û mezin bûm, zaroktî û xortanîya xwe di nav kolanên wê de bihûrandin, ez ê bîmînim deyndarê wî bajarî. Bajarekî ku ji raserî dîrokê were di nava Kurdan de, bi embara mêranî û mêrxazîyê tê nasîn, her weha mertala parastina çand û wêjeya Kurdî ye. Her çendî ku min parek ji temenê xwe li her çar parçeyên welêt, li gund û bajaran, li deşt û çiyayan qedand, lê ez dimînim lawikekî Kobanî û ew şopa hest û nestên xwe di aşopên min de diparêze.

-Di nivîsandina helbest û çîrokê de, hûn bi kê ji nivîserên kurd yan cîhanî bandor bûne?

-Bi rastî ev pîrs pîr dûbare dibe û her nivîskarek dibêje ku ez li ser xeta yan rêbaza fîan yan bêvan im, anku hinek kesan ji xwe re dikin mînak û tenê wan nîşan didin. Lê ya rast, ez bawer im zanîn nabe para hinek kes, ji ber wî kesî jî, ji hinek kesên din wergirtîye. Wê demê zanîna mirovahîyê tev berhema şaristanîyeke dirêj û dîrokeke wenda ye. Em tev bi hev hene û parek ji çanda mirovahîyê û çanda xwe ne. Her mirovekî berhemdar dilopekê li derya zanînê di çapa xwe de zêde dike. Ez tevan dixwînim û ji hemûyan hez dikim û wekî baxçeyekî her berhemek wekî gulekê, rengê li gulîstana wêjeyê zêde dike. Bêguman nivîsên hinek nivîskaran derd û kulên me vedibêjin em zû ji wan fam dikin û hinek jî, çêrî hinek mijarên dûrî me dikin em zû ji berhemên wan fam nakin her çende ku ew li gorî xwe di kîjan beşî wêje de dibe bila bibe, tişteki girîng dinirxînin û aşkere dikin.

-Jixwe we qonaxek ji temenê xwe li çiyayên kurdistanê jî derbas kiriye, gelo wê qonaxê çî li ezmûna we ya nivîsandinê zêde kiriye... derbarê jîyana li çiyê hûn çî dikarin ji me re bibêjin?

-Bêguman, jîyana li çiyayan tantêlî ti rengên jîyanê li devereke din nabe. Bi tevî hemû zehmetî û çetînîyên

xwe, ezmûneke bêhempa ye. Kesê ew nedî qet nikanê bawer bike. bi gotineke din ew jîyan di hemû beşên xwe de, ji hişên mirovekî normal di nava civakê de ferehtir û girantir e. wekî nimûne bi tevî hemû kêmasî û qelsîyên ku hebûn, ew jîyaneke ku li ti deverên cîhanê peyda nabe. Di civaka kurdan de, nimûneyeke nû bû. Civakeke ji çiqar û bercewendîyan dût, bi dilekî ku yek xwe ji ber hevalê xwe ve bide kuştin, xizmeteke bê dudilî, ji hemû gund û bajaran, ji hemû êl û eşîran, bi hev re li ser daxwaza welatekî bixebitin û hemû çetînîyên ku dibin kelem, bi sebir û arameke mezin tehmûl bikin, ev netîşteki hindik e. Tenê tu li wan çîyayên ku hov û dirinde nikanin lê bijîn, ji bo jîyaneke nû liberxwe bidî û civakekê li gorî xwe ava bikî ku ji hersê makezagonên sîkolojîya kurdan ya bingeîn dût û cuda ye. ji mal, cins û navdarîyê dût e, ew bi serê xwe serkeftineke mezin e. Her çiqas kêmasî û nebesî hebûn jî, lê ew civakeke ku kêmcaran dibûre dibe.

Her çende derfetên nivîsandinê dirêj li wan çîyan di salên şerê germ de kêmkirî bûn, lê dîsan rê li pêş nivîsa kurteçîrok, helbest, gotar û bîranînan vekirî bûn. Ez bawer im, tiştê herî zêde di nava şervanan de ku di hate nivîsîn helbest bûn. Lê di van salên dawîyê de, dema şer hate rawestandî û agirbesta salên 2000î û şûn ve, bîranîn û çîrok derketin pêş. Bi gumana min ew jî, ji ferhebûna dem û derfetan bû.

-Berhemên we heya niha çi hene, û ji bo pêşerojê çi projeyên we yên wêjeyî hene?

- Di nava salên şer de, min du pirtûk, yek çîrok bi navê Medya Sêwî û yek jî, helbest bi navê Roja Rojhilat nivîsîn. Pirtûka çîrokan min şand Ewropa heya niha wendaye û Helbest jî piştî 10 salan ji nivîsê, min di sala 1999an de şewitand. Piştî sala 2000î û damezrandina Dibîstana Wêje li çîyê ku ez yek ji her çar hevalên pêşîn bûm ku me ava kir, ji nû ve, vegerîyam bin konê nivîsê û min dest bi nivîsa kurteçîrok û helbestan kir. Du pirtûkên helbestan yek bi navê Xem û Xende û yek jî, bi navê zimanê Çîya û pirtûkek çîrok ya Paytexta Rûtan mi di wan salan de li çîyê çap kirin. Her weha min sê beş pirtûk ji helbestên şehîd û şervanan berhev kirin yek bi navê Hestên Hesandî û du jî bi navê Gulbang 1 û Gulbang 2 amade û çap kirin. Di nava wan her sê salan de, heftane koşeyekî min bi navê Rajena Civakê di rojnameya Azadîya welat de, li Bakurî welêt dihat weşandin. Piştê ez hatim Ewropa bi demeke kurt, li gel hinek biraderan û bi rêvebirîya Mamoste Alî Îso di kovara Gula Zeytûnê de, min serpereştîya beşê kurdî dikir, lê mixabin ku kovar ji ber sedemên aborî di hejmara heftan de hate

rawestandî. Ev demeke ku ez wergerana romana nivîskar Yehya Silo ya bi navê Herekol dikim, beşa yekê jê bi dawî bû û li ber çapê ye. Pirtûkeke hêjayî xwendinê ye. Ew çêrî demeke herî girîng ji qonaxên şoreşê û bi serpereştîya Ş. Xebat Dîrîkî, rewş û leбата yekênneyeke Gerîla li berqefên Herekolê dike. Niha li ber destên min pirtûkek bi naveroka xwe jîyana Gerîla û bi navê xwe Çavên Tazî heye. Ew ji çîrokan dirêjtir û ji helbestan ferehtir e. Hêvîdar im ku bersîva gelek pirsên ku di serê gelê me de ku ev demeke dirêj bêbersîv in mane bide.

Di nivîsên we de şewazê sembolîk diyar e, gelo di navbera şewazê cîwerî û yê sembolîk de, hûn meylê kîjan alî ne, û çima?

- Pirseke girîng e. Ma ne jixwe wêje bi hemû beşên xwe bi sembol û sîmayan tê nasîn. Vêca sembol li gorî min bêhtir meydaneke fireh dide nivîskar ku karibe hemû tiştên ku di serê xwe de bi rehetî binivîse û pênûsa xwe mîna hespekî girgîn berde meydana cîrîdê. Ya girîng netenê nivîsna wan peyvên bi sembol û sîmaya ne, wênaya ku ew sembol didin xwendevan girîng e. Yek

ji taybetmendîyên sembolan ew e: ku di pişt wan sembolan de çî name û wêne hene. Di vê dema bilez û bez de, mirov bi rêya sembolan û bi gotinên hindik dikare gelek tişên zirav û veşartî bi hêsanî bihîne xwêner.

Bê guman, ez bi herdu şewazan dinivîsim, lê simbol bi dîtina min ciwanîyekê dide çîrokê.

-Hûn rewşa wêjeya kurdî bi giştî û ya çîrokê bi taybetî çawa dinirxînin (bi taybetî li rojavayê Kurdistanê)?

-Di serê vê sedsalê de û naxasim di nava van çend salên dawîyê de, nivîs û berhem bi zimanê kurdî ji her demeke bihûrî bêhtir hatin çapkirin, bi taybet jî em qale kurmancîya latînî dikin. Roj li pey rojê bi tevî astengîyan, berhem û xwîner zêde dibin. Ev berhem him ji alîyê çendî û him jî ji alîyê cûnatî ve, gaveke girîng in û hêjayî pesindayîne ne. Hin kes nêrînên pêşwext li ser wan dibirin û wê bi demeke serberadayî binav dikin, lê ew her çiqas ne reşbînî be jî. Ne nêrîneke geşbîn e. di nava hemû civak û nivîskarên cîhanê de, ev kêşe dûbare dibe. Wê piştî demek kurt ji nava çendayetiye cûnetîyeke baş di nava berheman de derkeve pêş. Pêdîvîya vê jî bi rexnegir û kesên pêzo di warê wêjeyê de heye. Heya niha ev çanda rexneyê li nava wêjeya kurdî pir lawaz e, lê hevîdar im ku di demeke nêzik de geş û xweş bibe. Gelek kes vê yekê jibîr dikin, eger em ji hinek milletên din re bibêjin: ji zimanekî berbendkirî û ji kesên ku qet rojekê bi zimanê xwe neçûne dibîstanê, tevî vê jî gelek nivîskarên kurd hene û bi berhemên xwe çî bi helbest û çîrok û çî jî, bi nivîsa roman û şanoyan nekêmî nivîsakarên milletên cîranên me ne, kesek zû bi zû bawer nake. Ev bi serê xwe serkeftineke mezin e.

-Gotina we ya dawîn

-Nivîsadin, wêrekîyeke mezin e, lixwe mukirhatin e. Kesê newêre xwe aşkere bike û li xwe mukir bê, béguman wê nivîsên xwe ne zelal bin. Nivîskar berî her kesî wekî palasekê di kuçkeke fireh û dirêj de xwe li pêş her kesî rêdixe. Heke ew bi tirs nêzikî xwe bibe, wê xwîner jî, bi tirs nêzikî berhemên wî bibe. Ji ber nivîskar berî her kesî xwe dinivîse, xwe rexne dike jê şûn ve, berê xwe dide derdora xwe. Para herî mezin ji berhemên nivîskarekî, ew bi xwe ye. Nivîskarî him xwe û him jî civaka derdora xwe baş nasîn û aşkere gotin e. Nivîskarê ku ji aşkerekirin û zelalkirina bûyerên xwe û derdora xwe bitirse, wê ew tenê berhemên xwe bixwîne. ■





Komirên Bin Qeşa

Luqman Ebdulrehman

Çawa vê xakê pînebikim
 Û çawa vî gîyayî bidrûm
 Tim tovên rastîyê datînim
 Lê çima simbilên min
 bi derewan avisin ?
 Bawerî bardike looo
 Ez ê vê evînê bajom
 Zevîyakî vala
 Lê çawa çavan dizîzikînim
 arîyê dibînin
 Roj jinek e zû bardike
 Îro ji rûyê ba ...
 Girnijînê girî dikişand
 Û kerwanên dora kanîyê
 Xewnên xwe davên ava
 wê
 Divê serdemê de
 Bejna gemarê bilindibe
 Zelalîyê vedişêre
 Di tewîne ...
 Tu dizanî ...
 Ji van mirovan keviran
 çedikin
 Libin sîya dara ronîyê
 rûnişt
 Berên wê sor dibarînin
 Hêêê Hê
 Vê demê dev dirûtin

Û gêrik bê westan
 Genimê rojên giran
 dikişîne
 Gazî ba dike
 Were van komirên ...
 Bin qeşa salan pêxe looo
 Dinav bera min û buharê
 de
 Sozek heye
 Geh bi xwîne
 Geh mîna kobanê û
 şengalê ye lê ..
 Her ku kulîlik û sorgulan
 himbêz dik im ...
 Bihna şewatê tê min
 çav zuha bûn
 Lê ev gewdên bê serî
 Bi kude diçin lêêê ?
 di ximava hêvîyê dakir
 Pênûsa xwe
 Û li ser rûpelên zeytûna
 danî :
 Em li virin dayê ■



قصائد هايكو

جان دوست المختار

رياح عاتية	حفلة عرس
يعزف لحن حزين	يعقدان القران
سقف القصب	الفزاعة والمانيكان
.....	
قيلولة الظهيرة	رياح غاضبة
فوق سرير الأميرة	تخطف بعيدا
قطعة بواب	قبعة الفزاعة
.....	
نهاية الحب	حقل القصب
تتزين بالورود	سرب عصافير
حاوية القمامة	جلسة عزاء
.....	
اه ياظلي	تمتمة العجوز
إلى متى تكس الأرض	فوق كرسي هزاز
الا تتعب	حلم المراهقة
.....	
لايعجبه وجهك	رويدا رويدا
ينظر إلى اخمص قدميك	تمتلئ من ماء المطر
ماسح الاحذية	جرة القروية
.....	
أيام الحصاد	جلسة عامرة
في إجازة سنوية	ترتشف من الفنجان اسرارها
■ الفزاعة	العرافة
.....	



مع انهيار الليرة .. ارتفاع جنوني في أسعار العقارات



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat

ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (٧٦) ٢٠٢٠/٧/١ م